## Familjecentral bêhempa ye

Familjecentral (Navenda Malbatî) navendeke bêhempa ye, ji ber ku em kesên li vir dixebitin, dikarin di gel we bi hêsanî hevkariyê bikin, daku çareseriyan ji bo pêwîstiyên cuda peyda bikin. Gava pêwîstiya dêbavan bi piştgiriyeke zêde ya biçûk hebe, ev der ji bo wan, bi awayeke lez, hêsaniyan peyda dike. Erk û delameta xebata Familjecentral'ê ev e, tiştên ku dilê dêbavan û zarokên wan xweş dike, xurttir bike û pêşiya tiştên ku problem yan xirabî derdixin, bigire. Em vî karî dikin daku em:

- Her dem wek ciyeke nêzîk ji bo we amade bin.
- Tora civakî ya li dora zarok û dêbavan xurttir bikin.
- Karên nuh peyda dikin, daku hem zaro û hem jî dêbav pêkve bin.
- Wergirtina alîkariyê hêsan bikin.
- Wek navendeke zanyarî û agehiyê bixebitin.
- Ji bo we dêbavan xizmeteke baştir bikin.

Familjecentral li seranserê Swêdê heye. Ji çakiya xwe, agehiyên bêhtir li ser vê malperê bibîne: Föreningen för familjecentraler främjandes (FFFF): www.familjecentraler.se

FÖRENINGEN FÖR FAMILJECENTRALERS FRÄMJANDE

www.familjecentraler.se

KURDISKA

# Bi xêr hatî bo Familjecentral'a Xwe!




**Ciyê hevdîtina hemû kesên wê bibin dêbav û malbatan.**

# Hemû tişt li dor malbata bi zarok hatiye komkirin!

Wan hemû tiştên ku zaro, dêbav, yan kesên, ku wê nû bibin dêbav, pêwîstî pê hene, me li vir kom kiriye. Te derfet heye, ku gava pêwîstî hebe, tu herî muayenexaneya pîrikê, muayenexaneya sexbêriya zarokan, zarokxaneya vekirî, şêwirkarî û piştgiriya ji Xizmeta Civakî û ya herî dawîn, lê ne ya herî kêm jî ev e, şêwirkarî û piştgiriya ji pêzanîn û tecrubeyên dêbav û zaroyên din.

Hemû li ciyekî hatine komkirin. Serbest e, Çi cûre malbat dibe bila bibe, ji her malbatekê re vekirî ye. Hatina Familjecentral'ê bêpere ye.

Li vê derê, gelek kesên xwedî pîşe û sanatên cihêreng, ji bo qenciya te û zarokên te pêkve dixebitin: pîrik, hemşîreyên xwedîtaybetmendî, mamosteyên zarokxaneyan û sosyonom. Doktor û psîkolog jî hene gava pêwîstî hebe û her wisa jî, ji pîşe û sanatên din şêwirkarê bo malbatan hene. Em ji bo piştgirîkirina te û zarokên te û pêwîstiyên te, xwe amade dikin. Tu dikarî derbareyê gelek tiştan pirsan ji me bikî; pirsên wek li ser endîşeyên tendurustiyê, pirsên li ser pêşketina zarokên te û pirsên din ên rojane yên dêbavan.

## Bingeha vê xebatê

**Muayenexaneya Sexbêriya Zarokan.** (Sexbêriya Tendurustiyê ya ji bo Jinan, Sexbêriya Tendurustiyê ya ji bo Dayikan) Tu dikarî li vir, dema tu ducanî (heml) bî, herî nik pîrikê. Li vir, agehiyên derbareyê tendurustiya xwe werbigirî û beşdarê nav komeke dêbavan bibî. Gava mirov ducanî be, gelek pirs li serê mirov peyda dibin. Tu dikarî van pirsan, bi pîrika xwe re, yan jî pêwîstî hebe, bi psîkolog re, li nav komeke dêbavan guftûgo bikî. Gava zarokê te hat dunyayê, tu ji bo kontrolê diçî vir û li ser preventivmedel (navgîna pêşîlêgirtina avisiyê) şîretan jî werbigirî.

**Sexbêriya tendurustiya zarokan.** Li vê derê derfeta serdanên cihêreng ên ji bo tendurustiyê hene. Ta zarokê te dest bi dibistanê bike, carinan jî bo serdanê têne malê. Gelek caran hemşîreyeke xwedîtaybetmend dibînî, lê gava pêwîstî hebe, doktor û psîkolog jî. Li van serdanan em kontrola pêşketina zarokî dikin, vaksîn didinê û derbareyê tendurustiya wî dipeyivin. Bo nimûne derbareyê xwarin, razan û pêwîstiyên wî yên din. Piştgiriya ji bo dêbavan hem ferdî û hem jî li nav grûbê tê kirin.





**Şîretên civakî û piştgirî.** Şêwirdarê Xizmeta Civakî yan jî kurator, pir î caran sosyonom in, li ser hizir û pirsên te yên derbareyê zaroka te, rewşa te ya malbatî, yan jî derbareyê dêbavên te dikare bi alîkariya te rabe. Ew her wisa dikarin derbareyê pêwendîkirina di gel daîreyên cihêreng jî bi alîkariya te rabîn û agehiyên din ên li ser civakê bidine te.

**Zarokxaneya Vekirî.** Zarokxaneya Vekirî dil û navenda Familjecentral'ê ye. Tu dikarî di gel zaorka xwe herî vir û bilîzî, fêrbibî, ji hevaltiya bi dêbavan piştgirî werbigirî û malbatên li nêzîkî xwe nas bikî. Gava Zarokxane vekirî be, tu kengî bixwazî dikarî werî û herî. Pêwîst nake tu pêşî bêjî va ye ez têm. Li vê derê mamosteyên zarokxaneyê dixebitin. Her wisa jî xebat û çalakiyên li vê derê bi bername ye. Bo nimûne, dema xwarinçêkirinê, dema strandinê yan dema rengkirinê cihê ye. Heger te bivê tu dikarî beşdar bibî. Gava tu bi zarokê xwe re li wir dibî, hingê tu ji zaroka xwe berpirsiyar î.

Li vir gelek caran kesên din ên li Familjecentral'ê dixebitin dibînî. Hingê tu dikarî ew pirsa ku te li civîna demveqetandî ya dawîn ji bîr kiribû, ji wan bipirsî.